## Bernameyên demên betlaniyê

### Erdê lîstinê / salûna werzîşê

Ji bo zarok û mezinan derfetên lîstina fûtbal, walîbal, beskitbal û hwd heye. Tu dikarî saetên xebatê yên niha li ser tabloya ragihandinê ya kêleka erdê lîstinê û salûna werzîşê bibînî.

Tu dikarî derbarê bernameyên taybetî mezinan jî bipirsî û lê bigerî. Di beşên niştecihbûnê da gelek atmossferên hevpar hevrê di gel hejmareke zêde ya bernameyan (çayxane, kûrsên Terzîtiyê, odeya xwendinê û hwd) hene.

Proje û çalakiyên çandî-civakî bi awayê rêk û pêk ji aliyê kedkarên beşa miqatebûna civakî va di be warên cûr bi cûr da tên raberkirin. Ji kerema xwe serdana danezanan li avahiyên têkildar bike.
Ev babet renge wek mînak pêkhatî ji gerr û geştên li derdora ZASt'ê (Baxê ajelên kovî yê taybetî zarokan) an hevdîtinên çandî (Zora Halberstadt) bin.

Li nêzikî Ofîsa navendî ya ZASt'ê (ber bi navenda bajêr va) gelek bijarde ji bo kirrînê (sûpermarket, depoyên kincan) hene. Tu dikarî ji ZASt'ê bi peyatî û bi qasî 2 heta 3 kîlomitran xwe bigihînî van navendan.

Tu dikarî bi riya xebata gelemperî (wergera devkî, piştgirî di erdê werzîşê da an jî çalakiyên din, xebatên paqijiyê, tamîrkirin û hwd) di organîzekirina atmosfera jiyana hawîrdora xwe bi awayekî çalak beşdar bibî û pereyê xwe yê berîkan zêdetir bikî. Ji bo bikaranîna van îmkanan serdana alîkarîgihanên civakî bike.

### Mewqî Ofîsa navendî ya ZASt'ê li Halberstadt'ê

Ofîsa navendî ya ZASt'ê li Halberstadt'ê li Friedrich-List-Straße 1a, Li dorhêla başûrî ya bajarê Halberstadt'ê, ber bi Klussiedlung'ê va ye.
Navbira wê derê ji rawestgeha sereke ya Hesinrêya Halberstadt'ê derdora 5 kîlomitrî ye.
Tu dikarî bi Tramwayê (Straßenbahn) ji rawestgeha sereke ya Hesinrêyê li Halberstadt'ê biçî ZASt'ê: Xetê 2, ber bi Sargstedter Weg'ê, derketin ji „Herbingstraße" an „Felsenkeller"
An jî bi Utubûsê: Xetê 12, ber bi û derketin „Klusberge" va.
Eger ku tu bi peyatî dimeşî, tabloyên nîşaneyan ji rawestgeha Hesinrêya sereke (Tabloya rênîşander a sipî bi nivîsa "Penabertî" li sser wê) bişopîne.


## şop

**weşanvan:** Auslandsgesellschaft Sachsen-Anhalt e. V.
li ser navê komîserê entegrasyonê yê hikûmeta eyaleta Sachsen-Anhalt, Susi Möbbeck

**navnîşan:** *eine*welt haus | Schellingstraße 3–4 | 39104 Magdeburg
**Înternet:** www.agsa.de

**nivîs û sererastkirin:** Dr. Ernst Stöckmann
**V. i. S. d. P.:** Krzysztof Blau, Geschäftsführer der AGSA
**sêwirandin:** Matthias Ramme
**Illustrations / pictograms:** Ka Schmitz

Naveroka vê broşûrê ji aliyê mafê telîfê ve tê parastin. Ji nû ve çapkirina beşên nivîsê, nîgaran an pîkograman an karanîna wan di pergalên elektronîkî de tenê bi destûra nivîskî ya pêşîn a weşanger.

**Çapa 2-ê 2021-ê hate guherandin û berfireh kirin**


**© Hemû maf parastî ne**


**Ev insert (bi broşur) bi 12 zimanan hatiye weşandin. Hemî guhertoyên bi serhêl dikarin bi riya portalê entegrasyonê ya Saxony-Anhalt ve werin gihîştin: http://www.integriert-in-sachsen-anhalt.de/willkommen/erstinformationen-fuer-fluechtlinge/**

**Hûn dikarin vê broşûrê bi hemû zimanên berdest li vir binivîsin: integrationsportal@agsa.de**

AGSA

SACHSEN-ANHALT
Die Integrationsbeauftragte

WELTOFFEN WILLKOMMEN Sachsen-Anhalt

# Ofîsa serdana navendî ya penaxwazan a parêzgeha Sachsen-Anhalt'ê (Ofîsa navendî ya ZASt'ê li Halberstadt'ê)



# Pêngav bi Pêngav

**Gihîştin û navnivîsandin**
Piştî ku bi rêya nobedariya deriyê sereke yên têketinê gihîştî qada ofîsa navendî ya Ast'ê, di nêziktirîn demê da wek penaxwaz navê xwe tomar bike û vê navnivîsandinê piştrast bike (Beşa Arşîvê, Avahiya A).
Eger ZASt wek navendeke resepsiyona seretayî derheqê te berpirs nebe, dê navendeke wergirtina sseretayî ya guncan ji bo te were terxankirin. Ji bo veguhestinê, tu yê bernameyeke meşa trenê û bilêteke Hesinrêya Almanyayê werbigirî: Rawestgeha Hesinrêya Halberstadt'ê.

**Karta cihê mayînê û belgeya hatinê**
Di beşa Arşîvê da jî karta sitargeha (cihê mayînê) te tê dayîn. Karta Cihê mayînê divê hertim hevrê di gel rêwî be û dema hatûçûnê were nîşandan. Li ser vê kartê agahiyên têkildarî miqatebûna ji te, serdanên bijîşk û tiştên wekî wê tên tomarkirin. Ji bilî vê yekê, li vir tu yê belgeya hatina xwe werbigirî.

**Miqatebûna civakî**
Piştî wê tu yê serdana alîkarîgihanên têkildar bikî. Li vir tu dikarî pirsgirêkan hilêxînî û hin agahiyan derbarê mayîna xwe ya zêdetir li navendê werbigirî. Ji bilî vêya, odeyek dê ji bo te were terxankirin. Tu yê kilîta wê li avahiya B/12 an W/5 werbigirî,. navnivîsandina elektronîkî ji bo parvekirina xwarekê bi awayê hefteyî her duşemî ji alîkarîgihanên civakî werdigirî.
Ji kerema xwe bide ser danezanên nû!

**Raçavkirina Tendurustiyê**
Piştî wê tu yê serdana Rêveberiya Tendurustiyê li avahiya B/10 bikî. Li vir lênêrîna seretayî ya bijîşkî li ser te pêk tê. Ev lênêrîn li gorî qanûnê ji bo piştrastbûn ji nebûna nexweşiyên vegir, pêwîst e. Hemî qonaxên din li ZASt'ê li gorî vê mijarê ne.

**Bundesamt für Migration und Flüchtlinge (BAMF)**
Tu yê daxwaza xwe ya penabertiyê bo Rêveberiya Federal a Koçberî û Penabertiyê (BAMF) raber bikî. Bo vê mebestê tu yê vexwendnameyeke nivîskî werbigirî. BAMF li ber navenda wergirtina seretayî ye.

**Rêveberiya karên civakî**
Rêveberiya karên civakî li ber avahiya A li deriyê têketina sereke/avahiya nobedariya ofîsa navendî ya ZASt'ê ye. Tu ji bo daxwaz û wergirtina sûbsîdên (alîkariyên dewletê) li gorî Qanûna Sûbsîda Penaxwazan (sûdên ne-pere û sûdên pere, qaşo pereyê berîkê) serdana vê derê bike.

**Kinc**
Li her cihekî mayînê da depoyeke kincan ji bo hewcetiyên kesane heye. Ji kerema xwe ji bo agahiyên zêdetir serdana alîkarîgihanên civakî bike.

**Guhertina cihê daleqandina kincan**
Di odeya kincşûştinê da (Avahiya B, C, W5) şûştina kincan pêkan e. Li vir her wiha amûrên paqijiyê ji bo cihê mayîna xwe werdigirî.
Tu dikarî di demên diyarkirî da li vir rûkêşa lihêf û balgehên xwe biguherînî.

**Alîkariya bijîşkî**
Navenda Miqatebûna bijîşkiyê ya MediCare'ê yekemîn navenda serlêdanê di rewşa nexweşiya giran da ye. Heta wê radeyê ku nexweşiya te xedar nîne, beriya serdana bo bijîşk, te yê hewcetiyek bi guwahiyeke sîgortaya xizmetên dermanî ji Rêveberiya karên Civakî hebe.
Gelo tu ji ber bîranînên nerihetker, hestên nerênî, tirsên giran, xem û keser, tundî an ramanên xwekujiyê renc dikişînî? Gelo te serpêhatiyên behicîna derûnî ya giran hebûne ku di dema niha da hîn ji ber wan renc dikişînî? Kedkarên miqatebûna civakî û her wiha MediCare dikarin navê te di dema xizmetên derûnnasiya ZASt'ê da tomar bikin. Kedkarên xizmetên derûnnasiyê gotûbêj û temrînên derûnnasiyê yên seretayî ji bo kêmkirinan zexta derûnî û aramkirinê raber dikin.

**Parastin**
Di rewşa dîtina pevçûnên tund an azirîna te ji dijayetî an destwerdanan, heta radeya pêkan bilez serdana alîkarîgihanên civakî an nobedariyê bike
**Zzarokxane / Odeya parastina zarokan**
Li avahiya C'yê da zarokxaneya ofîsa navendî ya ZASt'ê heye. Li wir di atmosfereke parastî da gelek bername ji bo zarokên xwe yên di temenê ji 3 heta 11 salî dibînî.

**Veguhestin**
Parvekirin li er navçe û bajarên serbixwe yên parêzgeha Sachsen-Anhalt'ê li Ofîsa veguhestinê di demên ragihandî da pêk tê. Bo vê mebestê, bala xwe bide ser danezanên li avahiyên têkildar.
Tu divê di roja veguhestina xwe da, rûkêşa lihêf û balgehan, kilît û amûrên din ên radestkirî bo te, careke din vegerî avahiya B /12 an W5. Tenê di rewşekê da tu dikarî werî veguhestin ku mora Ne-pêbawer li ser karta te ya mayînê were xistin.

# Miqatebûna civakî

Girêdayî bi vê yekê tu li kîjan avahiyê werî bicihkirin, alîkarîgihanekî civakî dê berpirsê te be. Ew pêvajoyan organîze dike, şandiyên postê radest dike, formên daxwazê hevrê di gel te dadigire û berpirsê sereke yê bersivdana te li ZASt'ê ye. Tu yê ji wî/wê hemî agahiyên girîng derbarê mayîna xwe li navendê werbigirî. Fêrkirin jîji van babetan e (Rêzikên sitargehê, rêzikên tendurustî û paqijiyê parastina li hemberî agirpêketinê).

## Bernameyên navenda wergirtina sseretayî ya ZASt'ê li Halberstadt'ê

### Navenda Şêwirînê ji bo şêwirîna pêvajoya penabertiyê û şêwirîna vegeriyanê

Karîtasa (Caritas), tu dikarî têkildarî pirsên derbarê mayîna xwe li navenda wergirtina seretayî, serdana hevkarên navenda Şêwirîna Caritas'ê li avahiya C /1 ) jî bikî. Li vir, ji bilî vê yekê, di warê tevahiya mijarên mafzaniyê yên têkildarî pêvajoya penabertiyê, tu yê şêwirînê werbigirî. Li vir her wiha tu yê ji bo civîna Bihîstina xwe amade bibî.
**Şîret:** Derdem ku te nameyek wergirt ku naveroka wê tê nagihêjî, ji kerema xwe sserdana navenda Şêwirînê bike. Eger te bersiveke nerênî bo daxwaza xwe ya Penabertiyê wergirtiye, vî karî bilez cih bîne. Piştra Karîtas (Caritas) derbarê rêkarên qanûnî yên ihtimalî û her wiha derbarê vegerandina bo te şêwirînê raber dike.

### Şêwirîna Pêvajoya Penabertiyê ya Rêveberiya Federal (BAMF)

Beriya civîna Bihîstina xwe li BAMF'ê tu dikarî agahî, şêwirîn û piştgiriyê derbarê pêvajoya penabertiyê li F1'ê werbigirî. Şêwirîna komî an şêwirînên takekesî yên nihênî piştî dorgirtinê pêkan e.

### Rückkehrzentrum Sachsen-Anhalt

Eger tu erkdar bûyî ku ji Almanyayê derkevî an eger ku tedil heye ku vegerî welatê xwe, vegeriyana dilxwazî dewsgireke dilniya û kêmkêşe li hemberî vegerandina neçarî û bi zorê ye. Ji alîkarîgihanên civakî li cihê xwe agahiyan werbigire. Parêzgeha Sachsen-Anhalt'ê heta ji hêla aboriyê va pişta te ji bo vegeriyanê li gorî birayra te bi xwe dêbigire û dê vê riyê ji bo te hêsan bike.

### Kûrsên fêrkirina zimanê almanî

**Almanî hîn bibe!** Li her navendeke îqametê kûrsên fêrkirina zimanê almanî tên raberkirin. Navnivîsandin pêwîst e, ji ber ku hejmara kesan sînordar e. Ji kerema xwe ji bo agahiyên zêdetir serdana alîkarîgihanên civakî bike.